



Oberschule an der Koblenzer Straße · Koblenzer Str. 15 · 28325 Bremen

Oberschule an der Koblenzer Straße

Koblenzer Str. 15
28325 Bremen
Schulnummer: 409
Telefon: 0421 361-3029
E-Mail: 409@schulverwaltung.bremen.de
Website: <http://www.osk-bremen.org>

Dê û bavên hêja,

wekî ku hûn dizanin, dê dibistan heta dawîya betlaneya Osternê girtî bimînin. Da ku coronavîrus hûn bêhtir belav nebe û belavbuyîna wê bê rawestandî, senatoriya Bremenê hûn tedbîrên din jî girt. Hêdîkirina belavbuyîna coronavîrusê girêdayî van tedbîran e. Ger em van tedbîran bi cîh bînin, emê karibin ser bikevin. Ligel hijyen/paqijiyê divê têkiliyên civatî heta ji dest tê bîn kêr kirin. Û herweha divê kesên ku di nav xeterê de ne, bi vî awayî bîn parastin. Zêdetir agahî hûn dikarin di malperên Senatoriya Zarok û Perwerdê de bistînin.

Ger hûn wek dê û bav di vê pêvajoyê de li zarokên xwe , em wek dibistan ji bo zarokên ji polên 5 heta 8'an lênêrîna pêwîst pêşniyaz dikin.

Ev kes dikarin zarokên xwe bînin dibistanê. Ji mamostê re navê xwe, navê karsazê xwe û numreya telefona xwe bidin. Hûn dikarin li wir di derbarê lênêrîna pêwîst de zêdetir agahî bistînin.

Her çiqas neha li dibistanê ders neyên dayîn û zarok neçin dibistanê jî berpirsiyariya xwendekariyê berdewam e. Ev ne betlane ye.

Ligel hemî fikaran di derbarê belavbûna coronavirus de, divê hêlên din ên jiyane neyên ji bîr kirin. Mijareke giring perwerdekirina zarokên me ye. Dibistan ji ber vê yekê tedbîr digirin, da ku di heftiyên pêş de zarokên we dîsa perwerde bibînin û spartekan bigirin. Ji hemû zarokan hat xwestin ku roja îne pirtûkên xwe bi xwe re bibin malê. Ewê mamosteyên wan di rojên pêş de dê bi wan re bikevin têkiliyê. Dê spartekên cûrbecûr werin belav kirin û mamoste dê ji zarokan bersîvên/encamên spartekan bixwazin. Ji kerema xwe bila zarokên we nîşanê we bidin, ku divê çi bikin û hewl bidin bikin ku zarokên we ji bo karên dibistanê dem veqetînin. Her weha bi riya Internetê jî gelek pêşkêşî hene ku piştgiriya didin zarokên we, da ku zanebûna xwe pêş bixînin. Herî dawî hemî zarok bi riya platforma dibistanê ya „itslearning“ dikarin vîdyoyên "Sofatutor" bê pere bi kar bînin.

Bi piştgiriya we, emê bi hev re hewl bidin ku ji ber girtina dibistanan zarok zêde kêmasî jiyane nekin.

Ligel silavên germ

Christian Scheidt / Gerîndeyê dibistanê